DERXISTINA JI XANÎ

Kirêdar: Mafên Xwe Bizanin!

Her çend deynê we yê kirêyê hebe an hûn kontrata xwe ya kirêyê xera bikin jî, xwediyê xaniyê we NIKARE:

- Kilîda derî biguherîne da ku hûn ji xanî derkevin
- Tesîsatên we bigire (kareba, av, gaz)
- Eşya û tiştên we biavêje derve berî ku şerîf were

Heke ev tişt werin serê we, têkiliyê bi Şêwirmendê Mafê Tehliyeyê re daynin.

Xwediyê xaniyê we DIKARE ji we daxwaza derketina ji xanî bike eger kontrata we ya kirêyê tune be, kontrata we ya kirêyê bi dawî bibe an hûn kontrata xwe xera bikin.

Di rewşên jêrîn de dibe ku hûn bikarin kontrata xwe xera bikin:

- Heke hûn kirêya xwe nedin an ji 5 rojan zêdetir dereng bixînin
- Heke kesek ligel we bijî ku di kontrata we de nehatibe diyarkirin
- Heke hûn tiştekî xeternak bikin an jî gefa kirinê bixwin

Kontrata we heye? KONTROL BIKIN! Dibe ku we ev qebûl kiribin...

- "Ferexetkirina ji agahdariya nivîskî." Wê hingê xwediyê xaniyê we dikare we bide dadgehê **bêyî hişyariyê** ger hûn ji 5 rojan zêdetir kirêya xwe dereng bixînin.
- Hûn ê **cezayekî** bidin (wekî kirêya du mehan), heke hûn ji dema xwe zûtir ji xanî derkevin.
- Hûn ê kirêyê, lêçûnên dadgehê **Û** lêçûnên parêzerê xwediyê xanî bidin heke hûn ji xanî werin tehliyekirin.

Heke ku hûn kirêyê bidin an pirsgirêkê çareser bikin, **DIBE KU** pêwîst neke ku hûn ji xanî bar bikin, heke kontrata we bibêje ku hûn dikarin vê yekê bikin.

Heke heya dema ku agahdariya we biqede hûn ji xanî dernekevin û pirsgirêkê çareser nekin, xwediyê xanî dikare we bide dadgehê.

BIÇIN DADGEHÊ! Heke hûn neçin, xwediyê xaniyê we dê bi awayekî otomatîk qezenc bike.

Dema ku hûn derkevin ber dadgehê amade bibin

Gelo pêwîstiya we bi demeke zêdetir heye bo girtina parêzerekî an peydakirina cihekî nû? **Ji dadger** taloqkirineke bi du hefteyan **daxwaz bikin.** Dibe ku dadger razî bibe ku dîroka dadgeha we taloq bike.

We kirêya xwe bi derengî da û xwediyê xanî ew wergirt? Meqbûza xwe an jî çeka xwe ya betalkirî **nîşanî dadger bidin**. Dibe ku dadger nehêle ku hûn ji xanî derkevin.

We pirsgirêka ku bû sedema tehliyeya we çareser kir? Delîlan **nîşanî dadger bidin** ku we çareser kiriye. Dibe ku dadger nehêle ku hûn ji xanî derkevin.

LEGAL AID SOCIETY (833) 837-HOME

NHBA KURDISH KURMANJI - Evictions (615) 701-7957

AMAC (615) 988-6460

NASHVILLE CONFLICT RESOLUTION CENTER

ROOFTOP NASHVILLE

Ev agahdarî tenê ji bo Davidson County ye. Agahiyên li vir hatî dayîn armanc nake ku pêşniyaza qanûnî pêk bîne. Heke pirsgirêkeke we ya hiqûqî hebe, ji kerema xwe telefonî parêzgerekî taybet bikin an telefonî Komeleya Alîkariya Hiqûqî ya Middle Tennessee ya herêmî bikin an jî bi riya hejmara 1-800-238-1443 telefonî ofîsa Cumberlandsê bikin an jî bi riya hejmara 1-615-701-7957 telefonî Yekîtiya Baroyan a Nashville Hîspanikê bikin. Di 5/24an de hat revizekirin.

Pêvajoya Tehliyeyê çawa bi rê ve diçe?

Nîşe: Ev tenê ji bo kirêdarên di xaniyên kirêkirinê yên taybet de derbasdar e. Pêvajo ji bo xaniyên MDHA an Section 8 cuda ye.

Çima ez têm tehliyekirin?

KIRÊYA DEMA WÊ BORÎ

Heke hûn ji roja dayîna kirêyê û pê ve **di nav 5 rojan de kirêya xwe nedin**, xwediyê xanî dikare dest bi pêvajoya tehliyeyê bike. Xwediyê xanî **ne mecbûr e ku kirêya dereng qebûl bike.**

ÎHLALA KIRÊYÊ

Heke hûn an mêvanên we **tiştekî bikin ku di kontrata we ya kirêyê de dibêje lazim e hûn nekin**, xwediyê xanî dikare dest bi pêvajoya tehliyeyê bike.

MAWEYA KONTRATÊ QEDIYA

Heke **kontrata we ya kirêyê bi dawî bibe** an jî **kontrata we ya kirêyê tune be**, xwediyê xanî dikare **ji ber her sedemê** dest bi pêvajoya tehliyeyê bike.

Berî dadgehê çi qas dema min heye?

Heke qet kontrata we çênebûbe an jî di kontrata we de ji "agahdariya nivîskî nehatibe ferexetkirin", **14 roj** qewlê we heye ku hûn bidin. Heke we di 6 mehên paşîn de **jixwe dereng xistibe**, hûn ê tenê **7 rojan agahdariyê** bistînin û **şansê we tune ku hûn bidin.**

Kontrata xwe kontrol bikin! Heke we "ferexetkirina ji agahdariya nivîskî" qebûl kiribe, xwediyê xanî dikare vî gavî derbas bike û we rasterast bide dadgehê.

Qet nebe, xwediyê xaniyê we divê bi nivîskî agahiyê bide we:

- **Agahdariya 3 rojan ji bo "gefên li ser tenduristî û ewlehiyê"** (mînak: tundûtûjî, sûc)
- **Berî 14 rojan agahiyê bidin** ji bo tiştên wekî xirecirkirinê an jî paqijiyê. Heke kontrata we wisa dibêje, hûn **dikarin bimînin** heke hûn **pirsgirêkê çareser bikin.**

Divê xwediyê xaniyê we bi kêmanî **agahdariyeke 30 rojî** bi nivîskî bide we, ji roja ku divê kirêya we bê dayîn dest pê bike.

Dema ku agahdariya min qediya ez çi bikim?

Piştî ku agahdariya we qediya, xwediyê xaniyê we dê Fermaneke Girtinê **(agahdariya çûyîna dadgehê)** pêşkêş bike. Divê hûn kopiyeke wê **herî kêm 6 roj beriya dadgehê bistînin.** Ew bi gelemperî ji aliyê şerîf an peywirdarekî erkê ve tê, lê dibe ku ew bi riya postayê were heke ew hewl bidin ku wê radest bikin û hûn ne li malê bin.

Heke hûn Fermaneke Girtinê bistînin, HERIN DADGEHÊ! Heke hûn neçin dadgehê, xwediyê malê dê bi awayekî otomatîk qezenc bike û hûn ê xaniyê xwe winda bikin!

Dema ku ez diçim dadgehê çi dibe?

Dema ku hûn diçin dadgehê, mafê we heye ku hûn ji dadger daxwaza "**taloqkirinê**" bikin ku rûniştina we heya **15 rojan taloq bike**. Hûn dikarin vê demê ji bo **peydakirina parêzerekî** an jî **temamkirina pereyê kêm** bi kar bînin.

Heke xwediyê xaniyê we di dadgehê de bi ser bikeve, berî ku hûn bi darê zorê werin derxistin hîn **10 rojên we ji bo barkirinê** hene.

Piştî 10 rojan, xwediyê xanî dikare "fermana îadeyê" bistîne. Ev dihêle ku şerîf were û we û tiştên we bi zorê ji xanî derxe. Şerîf dê bi gelemperî di navbera **24 û 48 saetan** de were piştî ku xwediyê xaniyê we serî li hişyarnameyê bide.

LEGAL AID SOCIETY (833) 837-HOME

NHBA KURDISH KURMANJI - Evictions (615) 701-7957

AMAC (615) 988-6460

NASHVILLE CONFLICT RESOLUTION CENTER

ROOFTOP NASHVILLE

Ev agahdarî tenê ji bo Davidson County ye. Agahiyên li vir hatî dayîn armanc nake ku pêşniyaza qanûnî pêk bîne. Heke pirsgirêkeke we ya hiqûqî hebe, ji kerema xwe telefonî parêzgerekî taybet bikin an telefonî Komeleya Alîkariya Hiqûqî ya Middle Tennessee ya herêmî bikin an jî bi riya hejmara 1-800-238-1443 telefonî ofîsa Cumberlandsê bikin an jî bi riya hejmara 1-615-701-7957 telefonî Yekîtiya Baroyan a Nashville Hispanikê bikin. Di 5/24an de hat revîzekirin.